Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1254 | 9-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Mihemed Şêxo; Yek ji stûnên hunera kurdî

**Hêvî Keleş/Qamişlo**

**Birayê hunermendê nemir Mihemed Şêxo, hunermend Beha Şêxo diyar kir ku Mihemed Şêxo xwediyê gewriya zêrîn e û wiha got: "Bandora hunera Mihemed Şêxo heta niha jî piştî 36 salan ku koça dawî kiriye jî hîn bandorek wî li civakê heye."**



Hunermendê nemir Mehemed Şêxo, di sala 1948'an de li gundê Xecokê yê girêdayî bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik dibe. Jiyana zehmet hê di temenê piçûk de rûyê xwe nîşanê Mihemed Şêxo dide. Ji ber xizaniya malbatê ji xwendin û perwerdeya li dibistanan bê par dimîne

Wî bindestiya welatê xwe wek feqîrî ditît. Ji ber vê jî hê di salên ciwantiyê de jiyana xwe jî li gorî berjewendiyên welat û gelê xwe saz dike. Ji bo vê yekê jî her tim dikeve nav lêgerîneke. Ev lêgerîna wî di heman demê de lêgerîna bersiva hestên di dil û mêjiyên wî de bû.

Piştî ku wî di sala 1969'an de xwe di warê tembûrê de pêş dixe gund bi gund digere û tevlî şevbêrk û şahiyan dibe. Bi vê yekê ve piçek din xwe nêzî xeyalên xwe dike. Lêgerîna Mihemed Şêxo ya huner û jiyanê, piştî demekê berê wî dide Lubnanê. Li vir bi hinek hunermendan re Koma "Serkeftin" a muzîkê ava kir. Bi deng û hunera xwe di demek kurt de li Lubnanê gelek tê nasîn. Piştî ku bi hunermendê navdar ê Lubnanî Feyrûzê re têkiliya wî çê dibe, ji bo wî jî serdemek nû destpêdike. Ji Feyrûz gelek sûd digire, hunera Feyrûz li ser wî bandor dike û ev yek jî wek hilberînên erênî di hunera Mehemed Şêxo de xwe dide der.

Di sala 1972'an de piştî şerê Lubnanê Mihemed Şêxo vedigere welatê xwe Qamişlo. Bi alîkariya çend hevalên xwe komek muzîkê ava dike. Lê desthilatdariya Sûriyeyê nahêle ev kar bidome. Li pey vê ew tev li şahiya Newrozê dibe, deng û awaza wî derbasî dilê herkesî dibe.

Stranên ku di qadên Newrozê de tîne ziman bi agirê Newrozê re hestên gel coş dike. Her sitranên ku tîne ziman, di naveroka xwe de rastiyeka jiyana gelê wî vedigot. Lê piştî demekê zext û pêktiyên li dijî nasname û gelê wî pêk dihatin, li dijî hunera Mehemed Şêxo jî destpê dikin. Sitranên wî rastî astengî û qedexeyên rejîma Sûriyeyê tê. Li ser vê yekê hunermendê nemir di sala 1973'an de berê xwe dide Başûr û diçe Bexdayê.

Strana yekemîn "Bexçê Gula" li vir çêdike. Li Bexdayê di radyoya dengê Kurdistanê de distirê, tevlî mîhrîcana hunera kurd dibe. Di van xebatên hunerî de têkiliyên Mehemed Şêxo bi Mehemed Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Tehsîn Taha û gelek hunermendên din re çê dibe. Her têkiliyên ku çê dibin, bandoreke erênî li ser hunera wî dike. Ji şêwe û hunera hevalên xwe yên hunermend sûd digre.

Piştî demên li Başûr ew berê xwe dide parçeyek din, diçe Rojhilatê Kurdistanê bajarê Mahabadê. Di qampa penaberan de bi cîh dibe. Li vir zimanê farisî fêr dibe û dîplome distîne. Ew li Rojhilat pêşengên serhildanên gelê kurd Qazî Mehemed û Simko di sitranên xwe de bi bîr tîne. Piştî vê sekna wî rêveberiya Îranê Rojhilat jî lê teng dikin, her tim wî û malbatên welatparêz aciz dikin. Di encama zextên ku pêk tên de wî sirgûnî cihekî dûr dikin. Li cihê ku tê sirgunkirin di dibistanekê de dibe mamosteyê ola îslamê. Di vê dibistanê de şagirtê bi navê Nesrîn Melekê nas dike û sala 1977'an da pê re dizewice.


Piştî salên bi zehmet ên li Rojhilatê Kurdistanê, di sala 1983'an de vedigere welatê xwe bajarê Qamişlo.

Piştî ku vedigere xaka Rojava wekî ku zanibe dê zû ji nava me koç bike, di 41 saliya xwe de bi hemû hêza xwe bi hilberîna hunerî re eleqeder dibe. Di encama van xebatan de 14 berhemên nemir diyarî gel û netewa xwe dike. Di 9'ê Adara 1989'an de li bajarê Qamişlo diçe ser dilovaniya xwe.

Di derbarê salvegera wefata Hunermendê kurd Mihemed Şêxo birayê wî Hunermend Beha Şêxo ji Rojnameya me re axivî.

Beha Şêxo da zanîn ku Mihemed Şêxo bandoreke mezin li gelê kurd û hunermendên kurd kir û wiha domand: "Bandora Mihemed Şêxo li nifşê me û li nifşê nû heye, stran û awazên wî hîn zindî ne di mejiyê gelê kurd de. Bandora hunera wî li min gelekî hebû, ew weke mamosteyê min bû, herwiha ji kesayeta wî ya civakî min gelek tişt jê wergirtin. Ew rêka ku tê de dimeşiya di karê xwe yê hunerî de û helwestên xwe yê netewî de,ez pê ve hatim girêdan mîna gelek Kesan bê guman bandorek wî ya mezin hebû. Piştgiriyek mezin dida min û min pê re gelek stran tomar kirine.Bandora wî hem di naveroka stranên wî hem jî di lodiyên wî û awazên wî li min hebû."

Beha Şêxo diyar kir ku Mihemed Şêxo xwe hunermendekî Kurdistanî didît, herwiha xwedî helwest bû û axaftina xwe wiha qedand: "Dema tu vedgere jiyana Mihemed Şêxo ku xwe wekî hunermendekî Kurdistanî li xwe mêze dikir û di warê pratîk de ew gav davêtin. Mihemed Şêxo cudabûn li cem tune bû, beriya ku stranan li ser welatê xwe Qamişlo çêke, li ser Mehabad, Amed û Hewlêrê çêkiriye. Mihemed Şêxo di destpêka hunera wî de hat hezkirin ji ber stranaên wî xwedî wate bûn, kêşeya ku Mihemed Şêxo hilbijartiye û kiriye stran bi kêşeya miletên wî û welatê wî girêdayî ye. Bêguman dema tu birîna miletkî dibêje û dermanê wê jî ew milet wê wan stranan zindî bihêle. Dema sax bû ew û hunera xwe zindî bûn, dibistana ku Mihemed Şêxo afirandiye dibistanek taybet pê ye, jenîna tembûrê taybet pê ye wek kesayet, stran û awazên wî dubare nabe. Ev nifşê nû yê keç û xort ku Mihemed Şêxo nedîtine ku bi tenê pê bihîstine û lê guhdar kirine bi stranên wî têne girêdan û wan zindî dikin bi dengê xwe. Bi sedê hunermenda stranaên wî nûjen dikin lê belê stranên wî ji xwe ve jî hîna zindî ne."



Sudoku: Bersiv 30

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 5 | 3 | 9 | 8 | 1 | 6 | 2 | 7 |
| 8 | 7 | 1 | 2 | 6 | 4 | 5 | 9 | 3 |
| 9 | 2 | 6 | 5 | 7 | 3 | 1 | 4 | 8 |
| 2 | 3 | 8 | 6 | 1 | 5 | 9 | 7 | 4 |
| 1 | 9 | 7 | 8 | 4 | 2 | 3 | 5 | 6 |
| 6 | 4 | 5 | 3 | 9 | 7 | 8 | 1 | 2 |
| 3 | 6 | 2 | 4 | 5 | 9 | 7 | 8 | 1 |
| 5 | 1 | 4 | 7 | 3 | 8 | 2 | 6 | 9 |
| 7 | 8 | 9 | 1 | 2 | 6 | 4 | 3 | 5 |

Sudoku:Pirs 31

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 5 | | 3 | 9 | 7 | | |
| | | 7 | | | 4 | | 5 | |
| | 6 | | | | 2 | | | 9 |
| 7 | | 3 | 4 | | | 1 | | |
| 2 | | | | | | | | 6 |
| | | 8 | | | 5 | 4 | | 2 |
| 4 | | | 5 | | | | 2 | |
| | 9 | | 2 | | | 8 | | |
| | | 2 | 3 | 9 | | 6 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ferxê nû ye hêkên mezin dike:**
- Ji bo kesê ne li gorî hêza xwe tev digere tê gotin.

**Gavên xwe zêde dike:**
- Bi heman wateyê.

**Hê nebûye mirîşk hêkan dike:**
- Bi heman wateyê.

**Kerê guhsist tirên bendîn dike:**
- Dema kesekî ku mirov ti hêviyan jê nake û tiştên ecêb dike, hingê tê gotin.

**Kerê sist/guhsist tirên şidyayî dike:**
- Bi heman wateyê.

**Kevirê giran ne ilametê avêtinê ye:**
- Ji bo kesê xwe ber karê ne li gorî xwe re dike tê gotin.

**Kû re zer bû, kû re der bû/li kû zer bû, li kû der bû:**
- Dema tiştek ne li gorî ku mirov hêvî dike dibe hingê tê gotin.

**Lingê xwe ji berika xwe pirtir direj dike:**
- Ne li gorî hêza xwe tev digere.

**Lingê xwe zêde diavêje:**
- Zêdegaviyan dike; karê ne li gorî xwe dike; gotinên ji xwe zêde dibêje.

**Pariyê pirî gewrî dirî:**
- Kesê ser hêza xwe re bide ber xwe wê zererê bibîne.

**Qûn qûna mirîşkê ye hêk hêka qazê ye:**
- Karê ser xwe re dike; karê ji xwe mezintir dike.

LI SER NEXWESTINÊ

**Berê lênedanê ye:**
- Naxwaze bike.

**Bi mirina wî ye:**
- Pir pê ne xweş e; pir pê diêşe; naxwaze bike; jê re weke mirinê ye.

**Bi serê lêvan got:**
- Ne jidil got; ne bi xwestek got.

**Çavên xwe revandin:**
- Nexwest binêre.

**Dilê şivên bixwaze wê şîr ji nêrî bidoşe:**
- Ku dil bixwaze tişta ku neyê kirin nîne.

**Dilê şivên bixwaze wê têlme ji nêrî bike:**
- Bi heman wateyê.

**Kevirê giran ne ilametê avêtinê ye:**
- Naxwaze bike.

**Milê wî pê giran e:**
- Li xweşê wî naçe; pê zehmet e; naxwaze xizmeta wî bike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Yûsif Kûtê: Banga Rêber Apo bingeha aştiyê ye



Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, Yûsif Kûtê diyar kir ku banga Rêber Apo a bi navê Aştî û Civaka Demokratîk ku di 27`ê Sibatê de bi raya giştî re hate parvekirin, bangeke dîrokî ye û wiha got: " Banga Rêber Apo bingeha aştî û demokrasiyê ye."**R-3**

## 'Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8`ê Adarê zindî û watedartir kir'




Endamê Meclisa Giştî a Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD'ê Silêman Ereb têkildarî Roja Jin a Cîhanî wiha got: "Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8'ê Adarê zindî û watedartir kir. Herwiha jinê têkoşîna xwe veguhest tevahî qadên jiyanê. "**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1254 | 9-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## 'Koka şoreşê çand û huner e'

Rêvebera Çand û Hunera bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku gelek komên hêja di nava çand û hunerê de cihê xwe digirin. Herwiha ev kom amedekariyên xwe ji bo 8'ê Adarê û Cejna Newrozê dikin û got, "Em êrişên dewleta Tirk nakin kelem li pêşiya berdewamkirina xebatên xwe."**R-7**



## Ziyad Rustem: Ji ber êrişan pirsgirêka elektirîk û avê tê jiyan kirin

Hevserokê Desteya Enerjiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ziyad Ristem diyar kir ku ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser stasyonên elektirîkê û bi tayîbet Bendava Tişrînê, bi hezaran welatî bê elktirîk jiyan dikin.**R-6**

# BI RUHÊ 8'Ê ADARÊ

## EM Ê LI BANGA RÊBER APO XWEDÎ DERKEVIN

**8'ê Adarê Roja Jinên Kedkar a Cîhanê di encama ked, berxwedan û têkoşîneke pîroz a jinan de hatiye qebûlkirin. Îro bi hezaran jin di ronahiya fikir û ramanên Rêber Apo de û bi ruhê 8'ê Adarê ji bo parastina rûmeta gelan têkoşînê dikin. Rêber Apo jî ji bo jin û civakê têkoşîneke bêhempa daye û dide meşandin. Îro jî dem hatiye ku jin ji vê têkoşîna bilind re bibin bersiv, xwedî li banga dîrokî derkevin û azadiya xwe bi azadiya fizîkî ya Rêber Apo re tacîdar bikin.R-2**











**Kesên wêrek, dikarin biryarên stratejîk bidin!**
Ahmet Aktaş R-4



**Meha Remezanê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



## 'Çapemeniya Azad çavê rastiyê ye'

Rojnamevan Emrullah Acar diyar kir ku dewleta Tirk bi hedefgirtina rojnamevanan dixwaze rastiyê berovajî bike û wiha got: "Pêwîst e em îro ji her demê zêdetir dengê civakê ragihînin cîhanê".**R-4**

# 8’ê Adarê sembola têkoşîn û berxwedanê ye

Her sal li seranserî cîhanê 8’ê Adarê weke Roja Jinan a Cîhanî tê pêşwazîkirin. Mebest ji vê rojê balkişandina li ser kedxwarî û bêmafiya sîstema desthilatdar a li cîhanê ye.

Lîloz Hisên/ Qamişlo

Çîroka vê rojê jî vedigera sala 1857’an, ji fabrîqeya tekstîlê ya bajarê New Yorka Amerîkayê dest pê dike, di fabrîqeyê de bi dehhezaran jin û mêr kar dikirin, lê ji ber kedxwariyê û seetên kar yên zêde ji bo jinan, jinan serî rakir. Di 8’ê Adara 1857’an de 40 hezar karker ji bo heqdestê xwe bistînin di fabrîqeyê de dest bi gireva giştî kirin, polîsan êrîşî karkeran kir û derî li ser jinên karker ên di fabrîqeyê de bûn girtin, di encamê de di fabrîqeyê de şewat derket û 129 jin di encama şewatê de jiyana xwe ji dest dan. Tevî bûyera xemgîn çalakiya jinan dighêje armanca xwe û dengê jinan bilind bû. Ked, kîn û hêrsa jinan li Ewropayê belav bû.




### Dîroka 8’ê Adarê

Di sala 1910`an de sazyiyên enternasyonalîst yên jinan li paytexta Danîmarka Kopenhagenê hatin cem hev. Clara Zetkîn pêşniyar dike ku roja ji aliyê jinan ve bi berxwedaneke bi rûmet pêkhatî weke Roja Jinên Kedkar ya Cîhanê were qebûlkirin, ev pêşniyar ji hêla nûnerên tevlî civînê buyîn ve tê pejirandin. Roja jinên kedkar heta sala 1975`an tenê ji aliyê jinên kedkar ve li gora cewherê wê dihat pîrozkirin, lê di 16’ê kanûna 1977`an de NY 8`ê Adarê weke Roja Jinên Cîhanê îlan kir.

Li piraniya dewletan, bi çalakiyên çandî û organîzekirina meşan, nîqaşên li ser dozên jinan tê pêşwazî kirin, wekî din balkişandina ser jinên pêşeng di tevahî qadan de. Di cîhana erebî de, roja 8`ê Adarê gelek sembolên taybet digre nava xwe, di çarçoveya veghuertinên siyasî û civakî nîqaşên domdar ji bo dozên jinan têne kirin, tevî pêşketina di warên siyasî, aborî û perwerdeyê de, lê hîn jî êşê dikşînin ji paşguhkirin, tundî û cudabûnê.

Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, jinê roleke giring lîst di şoreşê de, jinê cihê xwe di gelek qadan de girt weke aliyê siyasî, leşkerî û aborî. Jinan di vê herêmê de pêşengtiya xwe îsbat kir, gelek saziyên jinan hatin ava kirin, qanûnên ku mafê jinan misoger bike û parastina wê ji tundiyê bike hatin derxistin. Jin li hemberî DAIŞ`ê û dewleta Tirk a dagirker xwedî helwesteke hevbeş bûn, îro ev berxwedan li hemberî hemû cûreyên zilm, koletî û dagirkeriyê dewam dike. Tecrûbeya jinan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hişt ku bibe nimûneyek ji bo giştî herêmê.

### Jina Kurd bû çavkaniya têkoşînê

Jina ku li hemberî koletî, zilim û dagirkeriyê rû bi rû ma ji hêla zihniyeta zayendperestî ve têne hedefgirtin. Ji têkoşîna jinên karker û ji Roza Loksumborg bigre ta Leyla Qasim. Ji Sara, Fîdan, Leyla ta Evîn û ji Jîna Emînî ta Jiyan û Nagîhan. Jina kurd bi cihgirtina nava şoreşê de jiyanek nû di bin banê fikir û felsefeya rêber APO de li Kurdistanê neqişandin. Jinên Kurdistanê xwe kirin artêş, partî û îro li tevahî cîhanê, têkoşîna wê ji bo hemû jinan bûye çavkaniya berxwedanê.

### Rêber Apo ji bo vê rojê dibêje:

“Beriya her tiştî ez ne qayîl im ku tenê 8’ê Adarê bibe Roja Jinan a Cîhanê.
Şertekî jêneger ê jiyanê ye ku hemû roj bi jinan û bi jinên azad re bin. Ev ji bo min qadeke xebatê ye ku her diçe lê hûr dibim.”

### Pirsgirêkên li hemberî jinan

Tevî pêşketina balkêş ya ku jinan bi dest xistiye, lê hîn jî jin di cîhanê de rû bi rûyê pirsgirêkên mezin tê û bi milyonan jin di nava malbatê û hem jî di kar û civakê de rastî tundiya fîzîkî, derûnî û aborî tê.
Di warê siyasî de kêmbûna nûnertiya jinê di seranserî cîhanê de heye, tevî hebûna jinên pêşeng li hin dewletan, lê nûnertiya wê di perlamantoyan û hikumetan de kêm e. Ev mijar bandorê li ser avakirina biryarên taybet yên girêdayî jinê dike. Wekî din pirsgirêkên çandî û civakî bandoreke pir mezin li ser jinan dike, ji ber ku di hin civakan de hîn adetên kevin diparêzin û ev yek azadiya jinan sînordar dike.

### Piştgiriya jinê ji hêla civakê ve

Bidestxistina wekheviyê ne tenê dikeve ser milê jinê, lê berpirsyariya civakê bi giştî ye, divê mêr beşke be di vê mijarê de û ji bona ku jin azad bibe destek û têkoşînê bike, rûbirûbûna cudahiyê û tevlîbûna avakirina civakek bi edalet, herwiha hikumet, kampanî û saziyên perwedê jî divê roleke giring di xurtkirina wekheviyê de bilîzin.
Pîrozkirina vê rojê ne tenê adetek salane ye, lê ew derfeteke ji bo guhertinê û bandorê li ser civakê dike, mirov kare vê rojê weke hişyarî bike ji bo nifşên nû, pênasekirina giringiya wekheviyê, jinan taşwîq bike da ku daxwaza mafê xwe bikin herwiha destkeftiyên ku jinan bidest xistine bînin ziman da ku zêdetir xebatên xwe berdewam bike ji bo pêşerojek bi ronî.

# JIN TV; Deng û îradeya jinên azadîxwaz

Ronaz Silêman/Qamişlo

**Kenala JIN TV di 8’ê Adara 2018’an Roja Jinên Têkoşer a Cîhanî de dest bi weşana testê kir. Xebatkarên JIN TV bi kamîre û pênûsên xwe rastiya civakê û bi taybetî ya jinan derdixin holê. Herwiha li dijî medyaya sereke ya zayendîparêz xebatên girîng didin meşandin.**

Ji aliyê Weqfa Newaya Jinê ve di 9’ê Çileya 2018’an de, di salvegera şehadeta her 3’ê jinên kurd ên têkoşer Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez de hat ragihandin ku wê kenaleke taybet bi jinan vebe. Kenala Jinan JIN TV di 8’ê Adara 2018’an roja jinên têkoşer a cîhanî de dest bi weşana testê kir û bi awayekî fermî di 30’ê Hezîrana 2018’an de bi dirûşma “Dengê jinê rûyê jiyanê” dest bi weşana fermî kir. Kenal JIN TV bernameyên xwe bi zimanê Erebî, Tirkî û hemû zaravayên Kurdî weşana xwe pêşkêş dike. Li Kurdistanê weşan dike û navenda wê li Ewropa (Holanda) ye. Jin TV weke yekemîn kenala li Kurdistan û duyemîn kenala li cîhanê ku bi destên jinan hatiye damezrandin. Jin TV ji bo bibe dengê resen ê hemû jinên Kurd, jinên herêmê û cîhanê xwe li welat û derveyî welat bi rêxistin kiriye. Herwiha xeyalên Nûjiyan Erhan, Denîz Firat û hemû şehîdên jin ên Ragihandina Azad pêk tîne.

### JIN TV li tevahî cîhanê dibe dengê jinê

Navenda sereke ya Kenala JIN TV li Holenda ye. Beşên wê jî li tevahî cîhanê hene. Herwiha navenda 2’emîn ku weşana zindî lê tê kirin li Rojava ye. Wekî din jî beş û ekîbên wê li her deverê hene. Li Rojava bi giştî beşê wê hene, li Mesir, Tûnis û Sûriyê jî nûçegehanên wê hene û xebatê didin meşand. Li cihên din jî bi rêka van nûçegehan ew xwe dighînin çalakî an mijarên taybet. Wekî din navendinên girêdayî beşa ekîbên kenalê li Reqa, Tebqa, Kobanê û ya bingehîn li kantona Cizîrê ye. li Bakur Kurdistanê ekîb û li Başûrê Kurdistanê jî navenda wê heye. Li navenda wê ya kantona Cizîrê beşa Erebî û Kurdî lî hatiye zêdekirin. Herwiha li navenda wê ya sereke nûçeyên bi zimanê Kurdî, Tirkî û Soranî tên pêşkêşkirin. Navenda Rojava jî weşana Erebî bi temamî dike û di nav re bernameyên kurdî ne. Ekîba Bakur jî ramyariya wê hinekî cûdayî ye ku nikare her tiştê li wir bînin ser ziman. Di heman demê de JIN TV li tevahî cîhanê dibe dengê jinê.

### Jin TV bi hebûna jinê ye

Ragihandin û televîzyon li ser asta cîhanê ji aliyê pergala mêr û kapîtalîzmê ve tê meşandin. Herwiha rûyê ked, hebûn, dîrok û jiyana jinan heta niha li tu ragihandinê derneketiye pêşberî cîhanê. Lê JIN TV bi deng û rengê xwe dîrok, rastî, têkoşîn û hebûna jinan derxist holê û dengê tevahî jinan ji bo raya giştî belav kir. Yek ji wan cihan jî Rojavayê Kurdistanê ye ku şoreşa jinan lê pêk hat û jinên ku bi pêkhateyên cur be cur dijiyan ji desthilatdarî û tundiya heyî re gotin êdî bes e. Lewra rola JIN TV li tevahî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê girîng e ku bibe dengê tevahî jinan. Îro xebatkarên JIN TV bi kamîre û pênûsa xwe rastiya civakê û bi taybetî ya jinan derdixin holê.

### JIN TV îradeya jinên azadîxwaz e

Ji dîrokê bigre heta roja îro her dem keda jinan tê xwarin, lê bi rêya kenala JIN TV keda jinan tê eşkerekirin. Heta niha jî tundî li ser jinan heye, lê xebatkarên JIN TV bi pênûs û kamîreyên xwe wan tundiyan derdixin holê û di ekranên xwe de teşhîr dikin. Di heman demê de hêz û vîna jinan jî di ekranên xwe de pêşkêş dikin. JIN TV îrade û kedeke mezin jêr divê, cûdayî kar giştî ye. Bi taybet kenaleke bi vî rengî ku jin bi tena serê xwe kar û xebatê rojnemevantiyê dide meşandin. Li pêşberî xebatên JIN TV de helbet wê zehemetî hebe, lê tevî van zehmetiya jî JIN TV gavên serkeftî avêtin û xebatên xwe roj biroj pîş dixe.

### JIN TV bi avabûna xwe şoreşa ragihandina jin pêk anî

JIN TV ji destpêka avakirina xwe ve ji bo civaka ku her tim digotin jin nikare bi tena xwe kar bike û kar bi rêve bibe, bersiv da û got ez ê hemû jinên cîhanê hembêz bikim, kar bikim û ez ê bibim zimanê tevahî jinan. Ev gava yekemîn e ku li cîhanê kenaleke ji bo têkoşîn û berxwedaniya jinan hatiye avakirin. Di heman demê de hemû xebatkar û rêveberên wê jî, ji jinan pêk tên. Çawa tevahî jinên cîhanê îlhama xwe ya herî mezin ji şoreşa jinan a Rojavayê Kurdistanê girtin, JIN TV jî bi avabûna xwe şoreşek pêk anî. Li kenala jinan JIN TV hemû beşên cûda yên ku jinan eleqedar dike hene. Herwiha dema ku li dîmen, nûçe, dosya ango bernameyan tê temaşekirin, mirov hîs dike ku bi dest û keda jinan hatiye çêkirin.
JIN TV li dijî medyaya sereke ya zayendîparêz e û nirxê jinê berbiçav dike. Kenalê jinan, bi wê îdîayê ye ku ji dinyaya jinê re bibe eyînik. JIN TV li dijî tundiya li ser jin û zarokan e, ên ku tundiyê dikin wan teşhîr dike.



# ‘Koka şoreşê çand û huner e’

Rêvebera Çand û Hunera bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku gelek komên hêja di nava çand û hunerê de cihê xwe digirin. Herwiha ev kom amedekariyên xwe ji bo 8’ê Adarê û Cejna Newrozê dikin û got, “Em êrişên dewleta Tirk nakin kelem li pêşiya berdewamkirina xebatên xwe.”

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Li her derê cîhanê mirov bi çand û hunera xwe tê naskirin û xuyakirin. Lê pêkhateyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikirin, bi taybet gelê kurd ji ber qedexeya li ser çand û hunera xwe, ji xebatên çandî û hunerî hatibûn dûrxistin, xebatên ku dihatin kirin jî bi rengekî veşartî bû. Di heman demê de her çiqasî zextên desthilatdaran li ser çand û hunerê hebûn jî, lê gelê kurd heta astekê hebûna çand û hunera xwe parastin. Bi çirozka şoreşê êdî pêşketin di hemû daqan de hate kirin. Yek ji qadê herî bi bandor û xwedî rol di belavkirina ruhê şoreşgerî de çand û huner bû. Çand û huner êş, azar, koçberî, kêfxweşî û berxwedaniya gel kêlî bi kêlî bi rêya stran, şano, helbest, dîlan, wêne û hwd…dike berhem û belav dike. Herwiha dibe deng û rengê gel.
Derbarê kar û xebatên Çand û Hunera bajarê Amûdê, herwiha amedekariyên wan ji bo 8’ê Adarê û Cejna Newrozê, rêvebera Çand û Hunera bajarê Amûdê Bêrîvan Elî ji rojnameya me re axivî.
Bêrîvan Elî diyar kir ku çand û huner neynika civakê ye û wiha got: “Koka şoreşê vedigere çand û hunerê, ji ber ku yên herî zêde nêzî gel û civakê hunermendin ku bi riya berhemên xwe her tiştên di dilê gel de derdixîne pêş çavên cîhanê. Di heman demê de dibin



dengê gelê xwe. Lê em weke gelê kurd berî şoreşê ji çanda xwe dihatin dûrxistin. Lê dema ku şoreş hate destpêkirin êdî navendên çand û hunerê hatin avakirin, ew jî destkeftiyên şoreşê ku bi berdêlên giranbuha hatin bidestxistin. Yek ji wan destkeftiyan vekirina Çand û Hunera bajarê Amûdê bû. Em weke çand û hunera Amûdê gelek xebatên pîroz didin meşandin û bi hemû şahiyên li bajarê Amûdê radibin û komên me pranî rolên xwe di van şahiyan de dilîzin.”

### ‘Gelek kom di nava çand û hunera Amûdê de cih digirin’

Bêrîvan Elî diyar kir ku gelek kom di nava çand û hunera Amûdê de cihê xwe digirin û wiha got: “Di nava Çand û Hunera bajarê Amûdê de gelek komên giranbuha û hêja cih digirin mîna Koma Şehîd Rîhan a dayikan. Di nava vê komê de nêzî 20 dayik cihê xwe digrin. Ev dayik da ku kevneşopiyên Amûdê û herêmê winda neçin, her li ber çavan derbas dikin. Koma şehîd Rîhan bi vê rolê dilîze û komeke xweser e. Koma Agirî komeke hêjaye duyemîn koma ku Rêber Apo avakiriye. Beşê yekem ê koma Agirî li Helebê ye û Koma Agirî ya Amûdê jî heye. Herwiha endamên koma şehîd Agirî ji destpêka şoreşê de ne û nêzî 13 endamên xwe hene. Ev kom her û her li pêş dikeve û di heman demê de bi stranên xwe navdarin. Koma Agirî di destpêka şoreşê de bi hemû rola xwe radibû, lê niha piraniya xwe di nava muzîkê de cih digirin, ji ber ku niha beş hatine berfirehkirin. Koma şehîd Delîla ya xweser jî, ji 10 heyanî 15 endama ye. Koma wêne jî 20 şagirtên xwe hene. Koma şehîd Yusra ya Şano ew jî xweser e, ev kom endamên xwe li gorî şanoyê dimînin, dema ku şano çiqas endaman hewcet bike, li gorî wê endam hene. Koma Şehîd Mizgîn a Dîlanê ya giştî jî cihê xwe di nava çand û hunera bajarê Amûdê de digir e. Ev kom jî, ji koma govendê pêk tê û 6 jin û 6 mêr cihê xwe têde digrin.”

### ‘Em ji bo 8’ê Adarê û Cejna Newrozê xwe amede dikin’

Bêrîvan Elî di dewama axaftina xwe de eşkere kir ku ew di nava amedekariyên 8’ê Adarê û Cejna Newrozê dê ne û wiha got: “Em ji meha yekê de, di nava amedekariyên 8’ê Adarê û Cejna Newrozê de ne. Hemû kom bi boneya nêzîkbûna van cejnan xwe amede dikin. Koma wêne niha ji bo 8’ê Adarê tabloyan li ser jinan xêz dikin. Herwiha Koma şehîd Yusra amedekariyên şanoyan ji bo 8’ê Adarê û Newrozê dikin. Di nava vê şanoya ku wê were pêşkêşkirin de 5 lîstikvan cihê xwe digirin. Koma Şehîd Rîhan jî, ji bona van cejnan dixebite. Di heman demê de ji bo 8’ê Adarê her sal pêşengeheke jin, ji aliyê Desteya Çandê ve tê lidarixsitin û mamosteyên hemû bajaran beşdarî vê pêşengehê dibin, çand û hunera Amûdê jî cihê xwe di nav de digire. kom keç û xoran jî bi dîlanên şoreşgerî dadikevin festîval, şahî û Newrozan. Ji xwe Kilîpên me jî, ji bo sala nû hene. Koma Giştî li ser 2 kîlpan dixebitin û koma xweser li ser kilîpekê dixebite, ev kilîp me şandiyê istîdyo, dema bên hazkirin wê werin weşandin.”




### ‘Gava çand nemîne şoreş bê wate dibe’

Bêrîvan Elî di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku êrişên dewleta Tirk a dagirker nabin kelem li pêşiya berdewamkirina xebatên wan û wiha got: “Civak rola çandê sereke dibîne. Lewra em êrişên dewleta Tirk nakin sedem ku em xebatên xwe rawestînin. Ji ber ku dijmine û her wê êrişan bike, dijmine û her dixwaze qirkirinê bike. Dijmin dixweze di qirkirina çandê, doza gelê kurd winda bike. Di heman demê de çand û huner rola sereke ya şoreşê ye, gava çand nemîne şoreş jî bê wate dibe. Tevî ku kesayetên me yên girabuha ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve têne hedefgirtin û şehîdxistin, mîna şehîd Rêber, Bavê Teyar û gelek xebatkatên din ên çand û hunerê şehîd bûn e, lê ew ji me re dibin hêza ku em bêtir li ser rêya wan xebatên xwe bidin meşandin û li pêş bixin. Çand û huner li pêşiya her kesî vekiriye û di hemû aliyan de em bi civakê re dibin alîkar. Armanca me ew e ku ciwanên pêşerojê pêş bikevin, xwedî li çand û hunera xwe derkevin. Ji ber çand û huner wê bi ciwanên xwe were avakirin, bi pêş bikeve û bimîne.”

# ‘Bi rêya stranbêjiyê hewl didim êşa welatê xwe vebêjim’

Navenda Nûçeyan

**Hunermendê kurd Alan Dirê`î diyar kir ku ew bi riya stranbêjiyê hezkirina xwe ji welatê xwe re diyar dike û wiha got: “Pêwîst e hunermendên êş, doz û berxwedana kurdan û hezkirina welat bighînin hemû cîhanê.”**

Yek ji hunemendên Rojavayê Kurdistanê ku bi dengê xwe êşa welat ji cîhanê re dibêje, hunermend Alan Dirê`î ye.
Alan di sala 1997`an de li bajarê Amûdê jidayik bûye. Wî di temenê xwe yê 7 salî de dest bi fêrbûna muzîkê kiriye. Ji bo fêrkirinê ew tevlî perwerdeya fêrbûna muzîkê bû û gelek astên muzîkê derbas kirin. Alan di gelek Fastevîlan û pêşbaziyên navneteweyî de beşdar bûye, di warê lêdana tembûrê de di 2009-2010 de li ser asta Sûriyê ew yê yekemîn derket.
Di derbarê muzîkjeniyê û



stranbêjiyê de hunermend Alan Dirê`î ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Bandora Aram Dîkran li hunera min hebû’

Alan Dirê’î diyar kir ku ew ji temenk biçûk de bi muzîkê re mijûl bûye û wiha got: “Di aliyê muzîkê de bandora bavê min li min hebû û piştgiriya min dikir. Wî dît ku ez ji muzîkê hez dikim û jêhatiya min tê de heye. Ji dema ku ez biçûk bûm, min her tişt ji xwe re dikr weke amûreke muzîkê û lê dida. Bandora herî mezin ku li min bû ji aliyê Aram Dîklan bû, hewiha bandora Mihemed Cizrawî û Tehsîn Taha jî li min hebû. Ev asta ku ez gihiştimê heta dema niha tu astengiyên mezin bi min re derbas nebûne, ji ber malabata min piştgiriya min dikin. Lê ji bo derxistina kilîpan zehmetî di ware aborî de derket pêş min.”

### ‘Muzîk riyeke ku tu karibe hestên xwe parve bike’

Hunermend Alan Dirê`î anî ziman ku muzîk nameyek ewê heye, ew jî xizmeta mirovahiyê ye û wiha berdewam kir: “Min xwest ku vê nameyê bi kar bînim û ji bo min muzîk jiyan e û hezkirin e. Ev êş û zordariyên ku di jiyanê de çêdibin, ez dikarim bi riya muzîkê û stranbêjiyê derxim holê. Herwiha mijarên girêdayî civaka me û êşên kurdan dikarim bi riya stranbêjiyê bêjim. Stranbêjî riyeke ku tu karibe êşên xwe û yên civaka xwe hem doza gelê kurd diyar bike ji cîhanê re.”

### ‘Divê piştgiriya hunermendan were kirin’

Hunermend Alan Dirê`î axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ez ji gelê kurd dixwazim piştgiriya hunermendan bike. Herwiha ji tomargehên deng, kampaniyên montacê û kenalên kurdan daxawaz dikim ku piştgiriya hunermendên kurd bikin. Ji ber ku dema zehmetî nebin hunermend dikare tiştên pir binirix biafirîn e. Zehmetî û zordariya ku bi kurdan re derbas dibe bi riya stranan hatiye gotin, lewma di vê piştgiriyekê bidin van stranbêjan ji bo ku berdewam bikin. Herwiha banga min ji hunermendên nûhatî re ew e ku bi zimanê xwe stranan bibêji in, ji ber ku hunermend dema ku bi zimanê xwe stran dibêje, civaka wî jê hez dike.”

**Berhemên hunermend Alan Dirê`î ev in:**

-Strana bi navê Keçko.
-Strana bi navê Çavgirtîng.
-Strana bi navê Te himêzkim.
-Strana bi navê Dûrbûn.
-Strana bi navê welatê min.
-Strana bi navê Şervanên Rûmetê.

# Ziyad Rustem: Ji ber êrişan pirsgirêka elektirîk û avê tê jiyan kirin

Hevserokê Desteya Enerjiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ziyad Ristem diyar kir ku ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser stasyonên elktirîkê û bi tayîbet Bendava Tişrînê, bi hezaran welatî bê elktirîk jiyan dikin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser binesaziya herêmê, bi taybetî ji ber hedefgirtina stasyonên elktirîk û avê, bi hezran welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji peydakirina av û elektirîkê de zihemetiyan dibînin.
Di derbarê êrişên li ser binesaziya herêmê Hevserokê Desteya Enerjiyê a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Zîyad Ristem ji Rojnameya me re axivî.



**‘Ji ber êrişên dewleta Tirk binesaziya herêmê ji kar ketiye’**

Ziyad Ristem anî ziman ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirîza elktirîkê tê jiyankirin û wiha got: “Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê herêmeke berferihe û pêdiviya wê bi hezar û 340 MW’î ji elektirîkê heye. Bendavên herêmê ên sereke bendava Tişrîn, Firat, Azadî û Siwêdiyê ye. Hilbirîna elektirîkê ya van bendavan beriya êrişên dewleta Tirk digihişt nêzî 300 MW’î. Dewleta Tirk a dagirker di sala 2024`an de bi belafirên xwe yên bêmirov êrişî stasyona Siwêdiyê û Bendava Tişrînê kir. Di encama van êrişan 12`ê torbîn li Siwêdiyê ji kar derketin û bi sedema êrişên li ser Bendava Tişrînê bendav ji kar derket. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê elktirîka ku tê hilbirandin tenê 100`MW’e. Bêguman ev bandorê li her tiştî dike, niha divê demê de stasyona Siwêdiyê kar nake û bendava Azadî 15`MW’î hildibrîne, herwiha bendava Firatê 100 MW`î hildibrîne. Ev eletirîk ji bo navendên xizmetguzariyê weke nexweşxane û nangehan tê şandin. Lê gelên herêmê bê elektirîk dimînin.”

**‘Êrişên li ser stasyonên elktirîk û avê sucekî dijmirovî ye’**

Ziyad Ristem da zanîn ku stasyona Elok ya avê ji sala 2019`an ve ji kar ketiye û wiha domanid: “Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên wê stasoyona Elok a avê dagir kirin, stasyon ji kar ket. Ji ber vê yekê tevahiya welatiyên bajarê Hesekê bê av dimînin. Çend caran Rûsya û UNCF hewl dan ku çareserkiyê ji stasyona Elok re bibînin, lê mixabin heta dema niha ev pirsgirêk nehatiye çaresekirin. Ji ber êrişên li ser bendava Tişrînê ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve bendav ji kar ketiye. Ji 7`ê Çileyê û heta îro Rêxistina UNCF û Xaça Sor hewldan ku derbasî bendavê bibin, da ku girûpên karmendên bendavê bugherin, lê mixanbin nikarîbûn derbas bibin. Ji ber ku ji aliyê dewleta Tirk ve erêkirin nehate kirin, ji ber ku êrişên li ser bendavê nehatin rawestandin. Pêwîste dewletên navnetewî û saziyên mafê mirovan bi karê xwe rabin û rê li ber êrişên dewleta Tirk a bigirin. Êrişên li ser stasyonên elktirîk û avê sûcekî dijmirovî ye.”



**‘Pêwîste saziyên navnetewî bi me re bibin alîkar’**

Ziyad Ristem axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji ber êrişên li ser bendavê xeteriyeke mezin li ser bendavê heye. Dema ku dagirkeriya tirk êrişî bendavê dike bendav bi tavahî zirarê dibîne. Herwiha Bendava Tişrînê 2`milyar m3 av dihewîne. Eger hat û hilweşiya wê karîseteke mezin pêk bîne. Ji ber vê yekê pêwîste saziyên navdewletî alîkariya me bikin, ji bo ku em pirsgirêka elktirîk û avê çareserbikin. Di heman demê de em dixwazin bi riya saziyên navnetewî, Rêxistina UNCF û Xaça Sor girûpên çeksaziyê derbasî bendavê bibin.”

## Meha Remezanê



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Di ferhengê de “germbuna rojê ya zêde, dema roj qum û keviran zêde germ dike û mirov pêxwas liser vê erdê bigere ji vê şewata lingan re tê gotin“ Ramadan.
Anjî ji gotina ramad „jiber tavê cîhên gellekî sor bûyî“ hatiye şîrovekirin. Henekî şîroveyên din jî hene dibêjin, wateya wê ya dîtirjî ev e: “dawiya demsala havînê û despêka demsala payîzê, dema ew baranak dibare û rûyê erdê ji gemar û qirêjiyê paqij dike, weke gotina ramadî, an jî ji bo tujkirin, seqandin û ziravkirina şûr û tîr de, kutandina wê hesinî dinav kevirên hişk de, ji gotina ramd derketiye. (ansîklopediya Îslamî)
Li gor salnameya Heyvê (qemerî) ku Ereb bikar tînin: piştî meha Şabanê berê meha Şewwalê navê meha neha ye.
Wateya gotina dawî ku baranê rûyê erdê çawa paqij dikir, divê di vê mehê de mirovê bawermend jî xwe ji nebaşî û gunehan weha paqij bike. Exlaqê xwe baş bike, di kesayeta xwe de guhertinên ber bi başiyê ve pêşxîne.
“Meha Remezanê; Ji bo mirovan rê nîşandana rastiyêye ku mirov karibe rastî û çewtiyan ji nava hev derxîne, bi delîlên eşkere û vekirî Qur’ana pîroz di vê mehêde hatiye daxistin. Ji we kî bigîhêje vê mehê, bira bi rojî vê mehê pêşwazî bike.“ (Beqere 185)
Ji bo çi û çawa pêşwazîya Remezanê tê kirin? Berî her tiştî şîroveya ku dibêje barana ku gemar û qirêjiyê paqij dike, wateya Remezanê ya derunî eşkere dike. Wateya wê bawermendên ola Îslamê weke kesayet divê xwe carekî din nû de bigrin dest û hêla xwe ya manewî û exlaqî bilind bikin. Ji ber însan dema hêla wê ya manewî tunne bibe, ji bo hawîrdora xwe dibe tehluke.
Îbadet û tatên tê de tên pêkanîn ji bo mirov vegere ser xwezaya xwe û bibe kesayetekî ku hemû mirov jê sûdê werdigirin.
Hêla dîtir, Remezan ew mehe kû têde Qur’an daketiye, ronahî û tarîtî ji hev hatiye veqetandin. Beriya Remezanê nêzikbun û pîvanên olî cuda bûn. Kê xwedan hêza maddî bûna, ew baş bû û di nava civakê de rûmeta wan dihatin girtin, lê heman demê kesên civak dimijand, dixapand û zordestî lê dikirin jî, ew kesayet bûn.
Di vê mehê de îbadeta rojiyê heye: kesayet xwe paqij dikin û pêşwazîya rojbûna Qur’anê bi zikê birçî pêk tînin. Mirovên têr dixwin û çavên wan birçî ne, bûne bela serê mirovahiyê. Kesê li ser hêza maddî pêşkeve û hêla xwe ya manewî bêhêz bihêle, ew kesayet di huzura xwe ya ruhî de aramiyê nikare bidest bixe. Remezan meha, rojigirtinê ye, bilindkirina berpirsiyariyên kesayetî û civakî ye, sipasdariya Xwedê ye, bîranîna kesên hejar e, parvekirina xwarin û vexwarinê ye, berê xwe dana rastiyan e, poşmanî û vegera ji gunehan e, meha îtîkafê ya tenê mayîn, kurbuna hizrê, bilindkirina rawiştê, xwe naskirin û Xweda naskirinê ye. Neha bi milyonan kesayet di vê mehê de rojiyê digrin, lê mixabin zulma xwe li ser hawîrdorê berdewam dikin. Hejaran bi bîr naynin û destê hevkariyê dirêjî wan nakin.
Ji exlaqê nebaş xwe dûr nagrin, weke adetekî rojiyê digrin û jiyana xwe ji rêzê didomînin.
Divê vê mehê de ruhê parvekirinê bilind bibe, divê dij derketina zilmê pêşkeve, divê rastî û dirustî bicîh bibe. Divê hemû bawermendên Îslamê jibo aşitiya navxweyî kar bikin dakû aramiya şexsî û civakî bicîh bibe.

# Jin û spor

**Navenda Nûçeyan**

**Bi saya şoreşa Rojava jin karî di hemû qadan de cihê xwe bigire, yek ji wan qadan jî spor bû. Jin karî xwe di vî warî de jî îsbat bike û roleke girîng bilîze.**

Tevî şer, şert û mercên dijwar di hemû waran de, di sala 2015’an de li bajarê Qamişlo tîm ji bo fitbola jinan dest pê kir û piştî wê pêngav bi fermî bi lîsansa ku Klûba Qamişlo di sala 2016’an de ji Desteya Werzîşê ya parêzgeha Cizîrê wergirtibû dest pê kir, di sala 2017’an de yekemîn lîga bajarê Qamîşlo di goka jinan de pêk hat. Ji wê demê û şûn ve gelek tîmên jinan hatin vekirin.
Di derbarê fêrbûna jinan ji sporê re lîstikvanên yaneya Stêrk Sîma Bazîr, Sîhavîn Bîjo û Robîn Ibrahîm ji Rojnameya me re axivîn.
Sîma Bazîr diyar kir ku spor gelekî sûda wê li bedena mirov heye û wiha got: “Spor laş xurt dike û enerjiyê dide. Nîvê roja xwe bi fêrbûna gogê re derbas dikim, ev saleke min e ku ez xwe fêr dikim, bûye tiştekê bingehîn di jiyana min de ku ez nikarim roja xwe derbas bikim bêyî ku ez gokê bileyzim. Topa lingan lîstikeke cîhaniye, ku gelek kes pê mijûl bûne û hezkirina wan ji fêrbûna wê re heye, yek ji van kesên ku hezkirina wan ji goka lingan re heye ku bi dilek kêfxweş ez gokê dileyîzim û di leystika wê de pêş dikevim. Wek jin astengiya ku bi min re derbas dibe ji aliyê bedena min e ku laşê jinan ne wek yê xortan xurte, masûlkeyên laşê me radewestin. Lê ev nabe astengiyek mezin li ber me ku em hobiya xwe ya fêrbûna gogê bikin.”
Di heman demê de Sîhavîn Bîjo da zanîn dema ku ew bi gogê dilîze kêfxweş dibe û wiha got: “Dema ku ez berê xwe didim lîstikgehê, ez li wir ez her tiştî ji bîr dikim û bi hevalên xwe re bi gogê dilîzim. Kesên werzîşvan hertim di nav civakê de bandora wan heye. Herwiha Divê kesên ku bi sporê ve mijûl bibe, îradeya wan xurt be û li du hopiya xwe ve herin. Zehmetiyên ku bi me re derbas dibin dema ku em bi gogê dilîzin, em gelek caran birîn dibin, lê ev nabe astengiyek mezin li pêşiya lîstika me ya bi gogê. Xwesteka min heye ji jinên ku dixwazin fêrî gokê bibin ew e ku bila nehêlin tu tişt li ber xwestekên wan bisekine ji ber di pêşerojê de wê rola wan di pêşxistina civakê de hebe.”
Di heman çarçoveyê de Robîn Ibrahîm balkişand ser girîngiya sporê û wiha got: “Min ji nav sporê lîsteka gogê hilbijart ji ber hezkirina wê di dilê min de heye, herwiha di cîhanê de ji aliyê sporê ve goga lingan ya herî bi nav û denge. Ji zaroktiya xwe ve min ji goka lingan hez dikir û hopiya min bû, ev bû sedem ku ez pê mijûl bûm. Di vê mirov cesareta wî hebe û îradeya wî xurt be ji bo ku li dû xewnên xwe be. Astengiyê bi min re derbas bûn di demên pêşî dema ku min dest bi lîstika gogê kir, ji aliyê civakê ve bû ku digotin tu jinî û bi van karan mijûl nebe, lê bi demê re min nema êdî ev gotin dibhêstin. Ji ber min dest ji hopiya xwe berneda û hertim hewil didim ku xwe pêşbêxim. Herwiha gotina min ji jinên ku dixwazin bi sporê ve mijûl bibin ew e, ku xwe pêşbêxin û li benda kesî nemînin.”



Sîma Bazîr



Sîhavîn Bîjo



Robîn Ibrahîm



# Yûsif Kûtê: Banga Rêber Apo bingeha aştiyê ye

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, Yûsif Kûtê diyar kir ku banga Rêber Apo a bi navê Aştî û Civaka Demokratîk ku di 27`ê Sibatê de bi raya giştî re hate parvekirin, bangeke dîrokî ye û wiha got: “ Banga Rêber Apo bingeha aştî û demokrasiyê ye.”

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Derbarê banga Rêber Apo a dîrokî de, endamê Yekêtiya Rewşenbîrên Kantona Cizîrê, Yûsif Kûtê bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Peyama dîrokî a Rêber Apo li Kurdistan, Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê deng veda, hûn vê yekê çawa dinrixînin?**

Banga Rêber Apo a bi navê Aştî û Civaka Dîmokratîk di 27`ê Sibatê de bi riya giştî re hate parvekirin, ev banga wî di nava gelê kurd û tevahiya cîhan de kêfxweşiyeke mezin bû. Herwiha Cîhanê û Partiya PKK`ê jî di hêla siyasî û leşkerî ev banga Rêber Apo qebûlkirin, di heman demê de di 1`ê Adarê de Partiya PKK`ê peyamek derxist û di wê peyamê de daxuyakirin ku wê agirbestê ji aliyê xwe ve radgihînin û tevlî banga Rêber Apo dibin. Ev jî gaveke pîroz e. Rojane gelê kurd li ser destê dewleta Tirk tên kuştin û heta dema niha li Pira Qerqozaqê û Bendava Tişrînê ev kuştin berdewam e. Di heman demê de li çiyayên Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê jî kurd li ser destê dewleta Tirk tên qetkirin, bi hiceta ku ew şerê terorê dikin. Ji ber ku zordarî û zilim li ser gelê kurd dihate meşandin, Partiya Karkerên Kurdistanê PKK`ê di sala 1978`an de hate avakirin. Ev zordariya li ser vî gelî dihate meşandin di hêla siyasî de çareserî tune bû û destpêka avabûna PKK`ê weke partiyeke siyasî hate avakirin. Piştî derbeya leşkerî a 12`ê Îlonê ya ku Kenhanî Bilind pê rabû, bi darê zorê hatin bi ser gelê kurd û PKK`ê, piştî wî PKK`ê biryar da ku raje çekan û di sala 1984`an de biryare şerê çekdarî hate standin. PKK`ê xwestin ku li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker bersivê bidin, ji ber vê yekê derketina PKK`ê pêwîstbû. Ji bo ku cîhan û dewleta Tirk gelê kurd nas bikin, ji ber ku tu kesî berxwedaniya gelê kurd nas nedikir û her kesî xwe didît dervî vê yekê. Herwiha PKK`ê di pêvajoya dîrokê de rola xwe erînî li ser qada siyasî û leşker di Rojhilata Navîn û cîhanê bi tevahî de lîst. Di wê demê de PKK`ê bi hemû erkên xwe yê netewî ku jê dihate xwestin dirabû. Wê partiyê biratiya gelan di Rojhilata Navîn de da xulqandin û hem jî ji bo çewsandina mafê gelê kurd bû bersivek. PKK’ê dikarîbû ku mafê kurdan misoger bike û kurdan bi cîhanê bide nasîn. Di nava van 45’salan de PKK`ê hatbû avakirn û gavên pir mezin avêtin.

**Banga Rêber Apo a dîrokî li herêmê û bi taybet li Rojhilata Navîn wê çi guhertin û veguhertina çêbike?**

Banga Rêber Apo wê bandoreke mezin li herêmê, Kurdistan û tevahiya cîhanê bike. Ev bang di herêma Rojhilata Navîn de dengek veda û ji bo şerê ku li Rojhilata Navîn tê kirin ji aliyê hêzên navdewletî, hêzên herêmê û girûpên çekdar wê banga Rêber Apo ji bo wan bibe riya çareseriyê. Herwiha Banga wî wê bandoreke mezin li siyaseta ku li Rojhilata Navîn tê meşandin bike, îro cîhan li ser Rojhilata Navîn bûye yek û dixwazin di hundirê wê de pirojeya Rojhilata Navîn bidin meşandin. Ew piroje li ser bingehê berferhkirina sînorê Israyîlê û hem jî pareçekirina herêmên û dewletên ku hene. Dibe ku hin dewleta ji nexşeya Rojhilata Navîn derkevin û dewletên nû di vê nexşeyê de werin avakirin. Ji bo vê yekê gavên pir mezin tên avêtin û cîhanê bi tevahî da xuyakirin ku ev banga Rêber Apo bangekî bi rûmete û piştgirtiya wê kirin. Herwiha Emerîka, Birîtaniya, Almaniya, Rûsiya, Çîn û bi dehan dewletên weke wan banga wî pîrozkirin, ev dide diyar kir ku peyama Rêber Apo cihê şaneziyê ye. Di heman demê de Rêber Apo xwedî berhemên giranbuha ye, ew manofîsta şarestaniya Rojhilata Navîn e, bi her pênc beşê xwe û xwediyê pirtûka ji şarstataniya Someran heta şarestaniyeke dîmokratîk e. Ev pirtûkên wî jî ji bo tekezkirina mafê gelê kurd, biratiya gelan û jiyaneke hevbeş.

**Nameya we çi ye?**

Banga Rêber Apo a bi navê Aştî û Civak Dîmokratîk bû nimûneyek ji tevahiya cîhan û bi taybet Rojhilata Navîn re, li hemberî vê yekê ku çek bên danînin ,pêwîste dewleta Tirk jî gav bavêje û hêzên xwe ji herêmên çi yê, Başûr û Rojavayê Kurdistanê bikşîne. Ji bo ku partiya PKK`ê karibe xwe fesix bike pêwîste kongira xwe çêke, ev kongir danîna çekdanînê û pêwîst e Rêber Apo bi xwe vê kongirê bi rêve bibe, herwiha eger ew vê pêvajoyê birêve nebe kes nikare bi rêvebibe. Ji ber ku ew xwediyê vê bangê ye, Armanca wî ji vê banga dîrokî ew ku aramî li tevahiya Rojhilata Navîn çêbibe û êdî name xwînin birje.Em jî vê banga Rêber Apo pîroz û destek dikin, ji ber ku gelê me di dîroka xwe a dirêj rastî komkujiyan hatiye û gelek caran ji mafê xwe bêparmaye. Ji ber vê yekê pêwîste her kes xwe di wê peyamê de bibîne û deweta bi awayekî rast li ser bisekine, dema ku pirsgirêka kurd di her çar parçeyên Kurdistanê de neyê çareserkirin wê Rojhilata Navîn bi aramî jiyan neke. Ji ber ku pirsgirêka serek di hundirê Rojhilata Navîn de pirsgirêka gelê kurde, banga me ji dewletên Navnetewî re heye ku bi hirmert li ser banga Rêber Apo bi sekinin.

# ‘Wê rêya yekrengiyê li Sûriyê bi ser nekeve’

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Çalakvanê siyasî Pîr Rustem destnîşan kir ku wê rêya yekrengî û yeknetewbûnê ji bo Sûriyê bi ser nekeve û got, “Helwest û nerîna kesên ku di Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî de hazir bûn ji bo projeya Rêveberiya Xweser erênî bû, wê ev komcivîn bibe bingehek ji bo siberoja Sûriyeke demokrat.”**

Piştî têkçûna rêjîma Beis û hatina rêveberiya HTŞ’ê êdî giştî Sûriyê derbasî qonaxeke din bû. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê komcivîn, panêl û hemû cureyên çalakiyan ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê hatin lidarxistin. Ji van çalakiyên ku li dar ketin, Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî bû. Yek ji kesên ku tevlî bûbû, çalakvanê siyasî û rewşenbîrê kurd Pîr Rustem bû. Derbarê lidarxistina komcivînê û siberoja Sûriyê, çalakvanê siyasî Pîr Rustem ji rojnameya me re axivî.

**‘Nerîna gelên Sûriyê derbarê proja Rêveberiya Xweser erênî ye’**

Pîr Rustem tekez kir ku helwest û nerîna kesên ku di Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî de hazir bûn ji bo projeya Rêveberiya Xweser erênî bû û wiha anî ser ziman: “Wekî ku em dizanin berî demekê Komcivîna Sûrî ya Gotûbêja Niştîmanî li dar ket, ez jî tê de hazir bûm. Ev komcivîn bi erênî bi rê ve çû, ji bilî herêma Rêveberiya Xweser, 110 kesayetên serbixwe, siyasetmedar û kesên xwedî bandor ji Siwêda, Deria, herêmên elewiyan, Şamê û hwd tevlî komcivînê bûn. Tevahiya gelên Sûriyê li hev civiyan da ku bi hevbeşî Sûriyeke demokrat, pirreng û li ser bingeha biratiya gelan ava bikin. Rêjîma Beis hişmendiyek di civaka sûrî de dabû avakirin ku gelê kurd veqtandinê ji Sûriyê dixwazin û Rêveberiya Xweser projeyeke li dijî gelê Sûriyê ye. Lê dema ku ev komcivîn hat li darxistin, hem jî gelên herêmên din hatin rewşa herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û projeya Rêveberiya Xweser nas kirin, nerîna wan hat guhertin. Nemaze, di komcivînê de çalakvaneke civakî ji Siwêdayê anî ziman ku projeya em li ser kar dikin ji bo piştî 20 salên din li herêma xwe pêk bînin, îro li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bûye. Wê jina çalakvan got me qet bawer nedikir ku projeyeke bi vî rengî heye û ev komcivîn bû derfetek da ku em hev binasin. Li gorî mijar û guftûgoyên vê komcivînê, wê bibe bingehek ji bo gavên cidî ji danûstandinên gelê kurd, Rêveberiya Xweser, QSD’ê û hwd… bi gelên Sûriyê re. Wê ev komcivîn bibe bingehek ji bo siberoja Sûriyeke demokrat.”

**‘Wê rêya yekrengiyê li Sûriyê bi ser nekeve’**

Pîr Rustem destnîşan kir ku wê riya yekrengî û yeknetewbûnê ji bo Sûriyê bi ser nekeve û wiha got: “Niha du rê li pêşiya Sûriyê hene, ya yekem ew e ku wê hemû gel bi bawerî, çand û olên xwe di Sûriyê de bi hevbeşî û bi rengekî demokras bijîn. Di encamê de wê ji hişmendî nijadperestî û siyaseta ku rêjîma Beis li dijî gelên Sûriyê bi dirêjahiya 50 salan dimeşan wê ji holê rabe, ev rê jî tişta herî durist e. Riya din jî hin alî dixwazin siyaseta rêjîma Beis dîsa vegerînin holê, ango siyaseta yeknetew, yekal û yekziman, eger Colanî be an ji bilî wî be, ev proje wê qet bi ser nekeve. Eger ev yek bû, wê şerên kûrtir û xirabtir li nav gelên Sûriyê rûbide, herwiha wê şoreşeke din li Sûriyê dest pê bike. Dewleta Tirk şerê navxweyî û destwerdanê dike armanc, ev yek jî ji ber tirsa xwe ji doza kurdî wisa dike. Lê bi banga Rêber Apo re, wê helwest û guftûtgoyaa dewleta Tirkiyê were guhertin.”



**‘Divê rewşenbîr çalak bin ji bo serxistina doza kurdî’**

Rewşenbîr Pîr Rustem bang li rewşenbîrên kurdan kir ku ew nekevin bin bandora nakokiyên siyasî, divê çalak bin ji bo serxistina doza kurdî û wiha axivî “Îroj projeyên nû li ser asta Sûriyê, Rojavayê Kurdistanê tên meşandin, geşedanên siyasî û guhertinên siyasî rûdidin. Lewma jî divê rewşenbîr li gorî van geşedanan tevbigerin û ew vê civakê bi rê ve bibin. Herwiha pêwîst e rewşenbîr ji bo gelê kurd xwediyên projeya guhertinê bin. Da ku civakeke azad were fêrkirin û ronîkirin, divê rewşenbîr bibin aktorên sereke. Lê mixabin hin rewşenbîr ji rewşenbîrên kurdan hene doza partiyên girîngtir dibînin ji doza netewa xwe û bûne parêzvanên berjewendiyên partiyên xwe. Wekî em dizanin hin nakokî di navbera partiyên kurdî de hene, lê divê rewşenbîr nekevin bin bandora van nakokiyan. Lê belê divê rewşenbîr wan nakokiyan bi dîtinên xwe û bi awayekî aqlane çareser bikin, erkê rewşenbîran e ku bibin xwedî rol di warê yekdîtina partiyên kurdî de , hem jî ji bo doza kurdî û yekîtiya gelê kurd xebatê bidin meşandin. Em hêvî dikin ku rewşenbîr, çalakvanên siyasî û civakî li gorî vê rewşa ku Kurdistan tê re derbas dibe çalak bin, ji bo serxistina doza kurdî bixebitin.”

# ‘Çapemeniya Azad çavê rastiyê ye’

Rojnamevan Emrullah Acar diyar kir ku dewleta Tirk bi hedefgirtina rojnamevanan dixwaze rastiyê berovajî bike û wiha got: “Pêwîst e em îro ji her demê zêdetir dengê civakê ragihînin cîhanê”.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Girêdayî hedefgirtina rojnamevanan, rojnamevan Emrullah Acar bersiva pirsên Rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**Armanca dewleta tirk ji hedefgirtina rojnamevanan çi ye?**

Ne tenê dewleta Tirk hemû dewletê netewperest çapemeniyê ji bo xwe wekî tehdîd dibînin. Lê belê hemû çapemenî yan jî rojnameger ji bo dewlet netew ne tehdîdin. Du beşên rojnamegeran ên çapemeniyê hene. Yek jê ragihandina Azad e, ya din jî çapemeniya ku girêdayî pergalê ye. Ji bo hemû dewlet netew û diktatoran Çapemeniya Azad tehdîd e. Çima tehdîd e? Ji ber ku çapemenîya azad dengê rastiyê, gelan û xwezayê ye. Di sala 1990’î de çapemeniya azad li hemberî hemû gefan dest bi weşanê kir û rastiya gelê Kurd bi cîhanê re parve kir. Ji ber vê yekê gelek rojnameger mîna Apê Mûsa, Huseyîn Deniz, Kemal Kiliç, Yahya Orhan, Hafiz Akdemir bi hovane hatin qetilkirin. Wê demê hêzên tarî xwastin ragihandina Azad ji holê rakin û metingeriya xwe misoger bikin. Lê çapemeniya azad li hemberî hemû êrîşan li ser lingan ma û hate roja îro. Îro ragihandina azad ji her demê xortire. Ji bo vê yekê dîsa rojnameger tên hedefgirtin.

**Çapemeniya azad çiqas bandor li cîhanê kiriye ku ji aliyê desthilatdaran ve tê hedefgirtin?**

Çapemeniya Azad dema dest bi xebata xwe kir ne digihîşt her derî. Ji ber ku derfeta salin 90’î ne guncaw bûn nûçeyên wê pir belav nedibûn. Lê piştî ku televîzyona Med Tv vebû êdî dengê gelê Kurd gihîşt hemû cîhanê. Bandora wê pir mezin çêbû, ji ber ku dema li hemberî gelê kurd dewletên navnetewî planên komployê xistin merîyetê, pêşî êrîşî ragihandinê kirin. Gelek caran televîzyon û rojname hatin girtin, hatin bombebaran kirin. Ev êrîş bandora çapemeniya azad dide nîşandan. Îro jî bi heman destûrê êrîşî li ser çapemeniya azad berdewam dikin. Li Bendava Tişrînê şerekî dîrokî tê meşandin. Dema şer li bendavê dest pê kir gelek nûçeyên derew ji aliyê ragihandina girêdayê dewleta tirk ve hatin parvekirin. Xwastin rastiyê berovajî bikin, lê Nazim Daştan û Cîhan Bilgin rê nedan vê yekê. Nûçeyên Nazim û Cîhan li hemû derê belav bûn û bandoreke mezin çêkir. Ji ber vê yekê ji aliyê dagirkeriya tirk ve hedef hatin girtin û qetilkirin. Her wiha Egîd Roj û Azîz Koylüğlu jî ji bo vê yekê hatin qetilkirin. Îro çavê cîhanê li ragihandina Azad’e, ev jî bi saya Nazim, Cîhan, Azîz û Egîd.

**Dewleta Tirk di aliyê hedefgirtina rojnamevanan de hemû zagonên navnetewî binpê dike û hedefgirtina rojnamevanan sucên dermirovî ne, lê sedem çi ye ku dewleta Tirk nayê darizandin?**

Heya îro dewleta tirk gelek caran di şerê li hemberî PKK’de çekên kîmyawî bi kar anîn e, ev sûcê şer e. Bi dîmen û agahiyan ev yek hate îspatkirin, lê nehat darizandin. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyêyê ev 14 salin ku şer heye. Di van 14 salan da gelek caran dewleta tirk sivîl bombabaran kirin û qetil kirin. Cihên xizmetguzarî hatin bombebaran kirin. Ev jî sûcê şere, lê ji bo darizandina wê çi dewlet gav navêt. Heya îro dagirkeriya tirk gelek sûcên şer pêkanîne, lê nehatiye darizandin. Êrîşkirina rojnamevanan jî sûcên dijmirovîne, lê mixabin li hemberî vî sûcî dengek bilind nebû. Gelek kesên ku dibêjin em demokratîkin, lê dema mijar dibe Kurd nabînin, nabihîzin û xwe nezan dikin. Li cîhanê gelek saziyên rojnameger hene. Li Filistînê jî rojnameger tên qetil kirin. Li tirkiyê jî gelek sazî hene, tenê saziyên wekî DFG, MKG, DİSK Basin-bertek nîşan didin û daxuyanîya didin. Lê gelek dezgehên ragihandinê yên ku xwe wekî bê alî pênase dikin bê deng dimînin û wekî nûçe jî derbas nakin. Ev bêdengîya cîhanê û herêmî hêz dide dewleta tirk ku rojnamegeran hedef bigire.

Dewleta tirk ji derveyî êrîşên çekdarî bi rêya ragihandinê şerê taybet dide meşandin hûn vê yekê çawe dinirxînin?

Şerê teybat bi gelek awayan tê meşandin û ev salên dirêje şerê teybet tê meşandin. Di nava şerê teybet de şerê derûnî yê herî ku tê bikaranîn jî li pêş tê girtin. Ji bo civakê ji rastiyê dûr bixe ev rêbazê şer hertim tê meşandin û ji bona vê yekê gelek televîzyon û rojname ji bona vê armancê weşanê dikin. 24 demjimêran karê wan nûçeyê derew û ji rastiyê dûr belav bikin. Li Almanya dema Hîtler’de Joseph Goebbels hebû, Goebbels dibêje ku: Derewên ku werin dubarekirin piştî demekî dibin rastî. Dewleta tirk jî ev destûr ji bo xwe hilbijartiye û her roj derewan dubare dike.



Armanca dubarekirinê rastiya berovajîkirine. Lê ji ber ku Çapemenîya Azad îro heye ew nikarin bighêjin armanca xwe. Di vê demê de û ji ber ku şerê teybat kûrtir bikin êrîşî çapemeniya azad dikin. Neha gelek hevalên me yê rojnameger di girtîgihandene, her oj rûpelên me tên qedexekirin ev jî rêbazekî şerê teybete ku li ser civakê tê meşandin.

**Erka ragihandina azad li hemberê êrîşen li ser rojnamevanan çi ye?**

Erka çapemeniya azad îro ji her rojê zêdetir e. Gelek qonaxên dîrokî hatin derbaskirin îro em di qonaxa herî girîng de ne. Çapemeniya Azad bi dirûşmeya emê rastiyan hertim bighînin civakê destpêkir û erka wê ya herî bingehîn jî ev e. Heya îro jî li hemberî çapemeniya azad gelek êrîş çêbûn, lê tu carî nekarîn dengê rastiyê bê deng bikin. Di sala 1994‘an da rojnameya Ozgur Gundemê hat bombabarankirin, lê piştî rojekî bi 4 rûpelan rojname careke din dest bi weşana xwe kir. Bi dehan rojnamevan hatin qetilkirin, lê îro bi sedan rojnameger li ser şopa wan kar û xebatê dikin. Erka rojnamegerên kurd ew e, ku nehêlin pênûs û kamîreya rêhevalên wan li erdê bimîne. Herwiha pêwîste ku em îro ji her rojê zêdetir dengê civakê ragihînin cîhanê.





## Kesên wêrek, dikarin biryarên stratejîk bidin!

**Ahmet Aktaş**

Heke ne Rêberekî mîna Abdullah Ocalan bûya, nikaribû ev biryara rawestandina şerê çekdarî bida û şwûna wê xebata demokratîk ragihanda.

Giringî û wateya vê biryarê pir mezin e. Ev biryar, hema di çend rojan de nehat dayîn. Ji bo biryarek wisa dorfireh a çarenûsa gel di xwe de dihewîne, diviya 26 sal derbas bûba, an jî heta ev biryar bihata stewandin têkoşîna dem dirêj a 46 salan diviya.

Ka bi gotinek Rêbar APO, em vê pêngavê şîrove bikin. Dibêje “çi li kuderê wenda bûbe, divê mirov biçe li wê deverê lê bigere”!

Ka em bi şêwazeke din li vê gotina wî binerin; “biryar li kuderê, di çi şerd û mercan de hatibe dayîn, divê mirov ji wir ve dest pê bike û were îro”!

Em bînin bîra xwe; biryara vê dozê û têkoşînê, di Newroza sala 1973an de li Bendava Çubuka Ankarayê, bi 3-4 hevalên xwe re dabû.

Hinek aliyên her du biryaran dişibin hev. Mînak, biryara niha jî bi 3 hevalên xwe re dide.

Lê şerd û mercên her du deman gelek ji hev cûda ne. Wê wextê, ne bîr û baweriyek stewiyayî, ne bîrdoziyek meyiyayî, ne rêxistinek, ne jî haya gel ji wan hebû, hema her ew çend kes in, belê dîsa yê bi bingehîn biryara têkoşîna ji bo şoreşê dide Rêbar Apo ye.

Îca kesekî di demek wisa bê derfet de, karibe curetî biryarek wisa mezin bike, ne hilwestek ji rêzê ye.

Di wê demê de hinek ji me jî li wan deveran bû û şahidê gelek gotinên ne li rê û ne goncaw, li dijî vê komê û bi taybetî dijî rêberê wê Abdullah Ocalan re dikirin. Digotin “macereperest, eceleker” û hwd.

Mirov dikare bêje piraniya van gotinan, ne bi zanebûn, belê ji nezanebûnê an ji tirsê dihatin kirin. Ma mînaka diya wî jî balkêşê, ne? Digot diya min ji min re digot “dînê çolê”!

Hilbet ev biryara giring, bi nezanî nehatibû sitandin. Na xêr, zanebûn û zanistî hebû lê pir kêm bû. Bêlê cewhêrê vê biryarê, xwe dispêre bingeha xurt a hezkirina welat û gel e, ya din jî curet û cesaret e!

Îca kesekî wisa di wan şerd û mercên kêm derfet de karibe bê tirs bi wêrekî biryarek wisa ya şer bide, ma wê piştî têkoşîna giranbuha ya 50’î salî, xwedî îradeyek ji pola afirandiye, êdî ne 3-4-5 heval/hogirê xwe, belê bûbe xwedî 3-4-5-6-heta bi deh milyonan alîgirê xwe, hîn bi hêsantir nikaribe biryara aştiyê jî bide?!

Jixwe him şandeya ku çûbû Îmraliyê digotin him jî di wêneyê wî de dihat dîtin ku gelek ji xwe bawer, bêtirs, bi wêrekiyek pir şênber, hemû berpirsiyariya vê bangê û pêngavê hilda ye ser milê xwe û ji xebata nuh a bê çek ya siyasî û demokratîk re amadebûna xwe diyar dikir.

Lewma, ji dil mirov dikare bêje ev pêngav bi ser dikeve, lê divê her alî bi berpirsiyariya xwe rabin, destên xwe bixin bin barê Rêber Apo hildaye ser milê xwe, bila barê wî hinek sivik bibe.



# ‘Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8’ê Adarê zindî û watedartir kir’

Endamê Meclisa Giştî a Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD’ê Silêman Ereb têkildarî Roja Jin a Cîhanî wiha got: “Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8’ê Adarê zindî û watedartir kir. Herwiha jinê têkoşîna xwe veguhest tevahî qadên jiyanê. ”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Piştî şoreşa 19’ê Tîrmehê têkoşîna jinên ku dikarîbûn hebûn û nasnameya xwe şênber bikin, derket holê. Îro li Rojavayê Kurdistanê wekheviya gelan misoger dibe û yekitiya jinan berbiçav e. Bi boneya 8’ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê, endamê Meclisa Giştî a Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD’ê Silêman Ereb nêrîn xwe der barê vê rojê de anîn ziman.

Silêman Ereb di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku Roja 8`ê Adarê tê wateya roja jiyanê û wiha got: “Roja 8`ê Adarê ne tenê rojeke ji bo jinê, belê di jiyana me de jin jiyane û her roj jî cejina wê ye, em dikarin roja 8`ê Adarê bi roja jiyanê bidin pênasekirin. Di bin dirûşma “Jin Jiyan Azadî” de, jinên hemû pêkhateyan; Kurd, Ereb, Suryan û Çerkezan...hwd têkoşînê dikin. Îro têkoşîna jinan û bi taybet jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê îlhamê didin jinên cîhanê û jinên azadîxwaz yên cîhanî jî dixwazin tevlî şoreşa jinan bibin. Dewletên desthilatdar dixwestin bi riya jinan hêz û hebûna jinên pêşeng têk bibin. Lê jinên Kurd ên mîna Sakîne Cansiz û bi hezaran mîna wê, li hemberî desthilatdariyê serî netewandin û heya roja me ya îro ev tekoşîn berdewame. Ev têkoşîn bi pêşengiya hevalên



mîna Sakîne Cansiz mezin bû. Di şoreşa Rojavayê Kurdistanê de gelek êrişên tund li ser jinê hatin kirin, lê bi pêşengiya jinan ew êriş hemû têk çûn. Îro YPJ`ê parastina tevahî destkeftiyên jinan dike. Bi saya bi hezaran jinan îro em 8’ê Adarê bi pêşengiya jinan pêşwazî û pîroz dikin. Roja 8’ê Adarê wê bibe roja berxwedan û têkoşînê da ku hemû roj bibin 8’ê Adarê.”

**Şoreşa 19`ê Tîrmehê û Jin**

Ereb di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Pergala mêr-dewlet bi salane hewil dide ku serhildan û daxwazên jin tune bikin û roja 8`ê Adarê weke rojeke ji rêzê bidin rûnişkandin. Li hember vê hişmendiyê jinên Kurd di sedsala 21`emîn de bi zanebûn û berpirsyariya mezinkirin û şopandina mîrasa jinên têkoşer yên cîhanî û Kurdistanê dest bi şoreşê kirin. Şoreşa 19`ê Tîrmeha 2012`an ku li Rojavayê Kurdistanê destpê kir bû modela guhertin û avakirina jiyaneke nû. Jinên Kurd ku pêşengiya vê şoreşê kirin, îro ji bo jinên Rojhilata Navîn û cîhanê bûn çavkaniya têkoşîn û berxwedanê. Ev şoreş weke mezintirîn destkeftiyên jin yên dîrokî jî tê pênasekirin.”

**‘Jin bingeha jiyan û civakê ye’**

Silêman Ereb da zanîn ku Şoreşa Rojava û pirojeya Netewa Demokratîk xwe dispêrin bîrdoziya Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocelan ku di vê der barê de bi sedan perspektîf ji bo jinan û gelên Rojihlata Navîn pêşkêş kir û wiha di domand: “Bê guman divê em bîrdoziya Rêber Apo ku ji bo jinên Kurd û tevahî cîhanê ên azadîxwaz pêşkêş kir, ji bîr nekin. Rêber Apo dibêje; heta ku jin koleye divê em behsa azadiya civakê nekin. Ji ber vê Rêber Apo di asta yekemîn de bi azadiya jin re mijûl bû û gelek xebat ji bo vê mijarê nîşan dan. Ji ber ku jin bingiha jiyan û civakê ye. Bîrdoziya Rêber Apo ji bo me û jinan dibistana azadiyê ye ku bi hezaran kes perwerde lê dîtin û xwebirêxistin kirin. Berhemên ked û xebata Rêber Apo li Rojavayê Kurdistanê derketin holê. Heger îro jinên cîhanê silgoana “Jin, jiyan, azadî” berz dikin û xwedî lê derdikevin, ev careke din xwe dispêre bîrdoziya Rêber Apo û têkoşîna jinên Kurd. Ev mijar ji bo me gelek watedar û binirx e




ku serkeftina şoreş û têkoşîna me teqez dike.”

**‘Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8`ê Adarê zindî kir’**

Endamê Meclisa Giştî a Partiya Yekîtiya Demokiratîk PYD’ê Silêman Ereb di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku şoreşa Rojava rihê 8`ê Adarê zindî kir û wiha got: “Heger mirov hevrûkirinekê di navbera wateya 8`ê Adarê beriya şoreşê û di roja me ya îro de çêbike, bê guman me gelek pêvajo li pey xwe hîştin. Ji ber ku li herêmên heta astekê naskiririna ji pirojeya Rêber Apo ya azadiya jin re hatibû çêkirin, 8`ê Adarê bi rengekî lewaz dihat pêşwazî kirin. Ev yek jî xwe dispart pergala zayendperest û baviksalar ya li Sûriyê û di nava civakê de. Şoreşa Rojavayê Kurdistanê rihê 8`ê Adarê zindî kir, çawa ku di salên 80`î de bi sed hezaran jin daketin qadan û behsa mafê xwe kirin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî jinan ev têkoşîn geş kirin, watedartir kirin û vegerandin tevahî qadên jiyanê. Pergala ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêşengiya jinan hatiye bi cih kirin, ji bo jinên cîhanê bûye qada berxwedan û têkoşînê ku jin bikarbin careke din li derdora doza xwe kom bibin, nûnertiya xwe ya siyasî, leşkerî, aborî û hwd bikin. Di dawî de jî em dibêjin roja 8`ê Adarê li tevahî dayikên şehîdan pîroz be û li tevahî jinên cîhan jî pîroz dikin.”

# ‘Pêwîst e dagirker ji axa Efrînê derkevin’


**Navenda Nûçeyan**

**Rêveberê Kombenda Efrîn a Civakî Ibrahîm Heftaro diyar kir ku ew ji bo vegera koçberên Efrînê li ser mal û milkên xwe di nava liv û tevgerê de ne û wiha got: “Divê ew kesên ku di Efrînê de niştecih bûne derkevin û gelê herêmê vegere li ser cih û warê xwe.”**

Piştî ketina Rêjîma Baas û hatina rêveberiya HTŞ`ê li ser desthilatdariya Şamê ya nû, li herêmên dagirkirî bi taybet li Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê hîn jî dagirkerî berdewam e û welatî nikarin vegerin li ser cih û warê xwe. Herwiha di vê dema dawî de li ser vegera koçberan gelek nîqaş tên kirin.

Di derbarê rewşa Efrînê û vegera koçberan Rêveberê Kombenda Efrîn a Civakî Ibeahîm Heftaro ji Rojnameya me re axivî.

Ibeahîm Heftaro di destpêka



axaftina xwe dde wiha got: “Piştî hatina HTŞli ser desthilatdariya Şamê gelek guhertin di Sûriyê de pêk hatin û vê yekê bandor li tevahiya gelên Sûriyê kir. Piştî hilweşandina Baas, dewleta Tirk a dagiker sûd ji vê yekê girt û êrişên xwe yên li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdetir kirin. Herwiha êrişî Şehbayê û Til Rifetê jî kir, di encamê de gelek kes şehîd bûn û şêniyên wan cihan koçberî herêmê bi ewle yên Rêveberiya Xweser bûn. Herwiha careka din Efrîn bû qurbaniya diyaloga di navbera Erdogan û Ebû Mihemed Alcolanî de û li herêmên dagirkirî komkujî berdewam in. Herwiha serdana Ebû Ehmed Cewlanî ji bajarê Efrînê re bê encam bû û piştî wê serdanê bi sedan welatî hatin girtin.”

**‘Pêwîst e gelê Efrînê vegere li ser cih û warê xwe’**

Ibeahîm Heftaro wiha domand: “Piştî têkçûna Rêjîma Baas û hatine desthilatdariya Şamê ya nû, pêwîste ew kesên ji Şam, Dara`a, Himis û Helebê ên ku li Efrînê bi cih bûne derkevin û vegerin cih û warên xwe. Em jî weke Kombenda Efrîn ketine nav liv û tevgerê da ku her kes vegere ser mal û milkên xwe. Di vê drbarê de me meşek li pêşiya Rêxistina UN li darxist, ev meş ji bo ku ew kesên di Efrînê de niştecihbûne derkevin, herwiha gelê Efrînê vegere li ser mal û milkê xwe. Li ser vê bingehî me gelek civîn çêkirin. Yek ji wan civînan bi



hevseroka Desteya Têkiliyên Derva a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Elham Ehmed re çêkir, nîqaşên ku di civînê de hatin kirin, mijare vegera koçberan bû. Elham Ehmed ji me re diyar kir ku di civînên wan yên li dserve çîdibin xala sereke vegera gelê Efrînê li ser mal û milkên xwe ye. Rêveberiya xweser jî tekez kir ew ji bo vegera koçberên Efrîn danûstendinan dikin.”

Rêveberê Kombenda Efrîn a Civakî Ibeahîm Heftaro axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em ji hêzên navneteweyî daxwaz dikin ku rê li ber dagirkeriyê bigrin û bibin alîkar da ku gel Efrînê vegere li ser axa xwe jiyan bike. Herwiha banga min ji gelên herêmê re ew e ku her kes bi hev re jiyan bike û destek bidin hev.”